

RIZA ÇOLPAN

DAYİKA BEDBEXT

# EZİM KURDISTAN



Weşanên Dersim



Weřanên Dersim : 5  
Çapa Yekem : Çileyê Pařin 1995

Adres:

Rıza Çolpan  
33 Villiers Str.  
Merrylands 2160  
Sydney/AUSTRALIA

## N A V E R O K

Pêşgotın.....	5
Gazinek jı bı dıl	
Ka Kurdîstan?.....	10
Çarinên şiretan jı bona PKK	
Kurd û Kurdîstan.....	15
Bese, bese bırakuji.....	31
Kesên gemarin.....	36
Bang û gotinên Pêşmergan.....	39
Kurte jiyana mın.....	46
Pırsin jı Xwedê ra.....	53
Ev e jıyan.....	57
Çıra em lı bın destanın?.....	59
Megre Dılo.....	61
Hesret.....	65
Jı bona cangoribûna Dr. Said	
Şerefkendi û hevalên wi	
Em birnakın.....	68
Ahmed'ê Xani gazi me dıke.....	71
Karên dijmin û şiretên mın.....	73
Jıyan û Cihan.....	81
Ezım Kurdîstan.....	82
Kurdo tu guh bıde ser mın.....	102
Şêrê Kal.....	106
Bırakuji.....	107
Ez xemgınam.....	112
Gazina Kurdperweran.....	113

## P Ê Ş G O T I N

Xwendevanên giranbîha,

li pişti pirtûka mîna " Destana Diroka Kurd û Kurdistan " û " Hiroşima Duwem Helebce " ev a pirtûka mîna sêyem ê a helbestane. Ango beri ev pirtûkê de du pirtûkên minên helbestan hatibûn çapkîrî û weşandin. Lê sed mixabîm ku ew herdu pirtûkên min ewqas li nav gel de belav nebûn û negihîştin destên xwendevanên Kurd û Kurdistan. Lê ez hêvi dikim li pêşerojan de ev pirtûkê bigihîjin destê xwendevanên Kurd û li nav gel de belav bibin û gelê Kurd ev pirtûkê bigihînin. Bî taybetî xwendevan û kesên " Wêjehez " kesên " Torevan " ev pirtûkê bigihînin.

Xwendevanên hêja,

bî taybetî min xwast ku ez hemû navên bajarên Kurdistan li nav çarînan helbestan de jî xwendevanên bîdîm naskirîm. Jî bona ev jî min ew nexşe ku Enstîtûya Kurdî a Paris'ê derxistibû, jî xwe ra kir rêber û li gor ew nexşe Kurdistan min navên hemû bajarên Kurdistan mîvîsand û li nav çarînan helbestî de anî ber çavan. Bibe ku hîn nav jî wera xerîb bîn; lê salixdana min jî wera, divê hîn li ew nexşe ku Enstîtûya Kurdî a Paris'ê derxistîye li ew nexşê binhêrî û navên kevî û ên nû li hev cûda bikin.

Li milê din de, min naverok û babetên ev pirtûkê hemû li ser bûyer û qewîmandînan welêt û hîn kes û tîştan de nivîsin. Ango min li gor neveroka bûyer û qewîmandînan ev çarînan nivîsandîne. Ev çarînan hemû li kûrahîya dilê min de derketîne, bibe ku li hîn kesan xweş ney û hîn kes necibînin, rexneyê min jî bikin. Lê ez bawerîm hîn kes jî hezbîkî û bîcibînin. Jî ber ku min li hîn çarînan de pesna hîn rêber û serokên hêzên Kurdistan kirîye, li hîn çarînan

de ji, mın bı tûji rexne li wan gırtiye, li dıji kar, kırın, çalaki û tekoşinên wan derketime. Ango li lun çarinan de ez pesna wan dıkım, lê li hin çarinan de ji, ez bı tundi û tûji dıçım ser wan, rexneyên wan dıkım, li dıji tevgerên wan derdıkevım. Jı bona ev ji, ez hêvi dıkım hûn xwendevan mın tawanbar nekın û li dıji ev gotinê mın û çarinên mın dernekevın û nebêjın " ev çi dubendiye?". Çawa ku hûn ji dızanın, jiyan bı xwe ji dubendiye. Jı ber ku em mirov li nav dubendiyan de dıjin. Jı bona ev ji, mirov carna karên qenc û baş dıke, carna ji kar û berên ne baş û bêt erêmi dıke. Bı kurtasi em li nav ev du tıştan de dıjin " bedi û qenci ". Serok û rêberên me gelê Kurd ji, li dirokê de heya roja iro, carna kar û berên qenc kırıne, carna ji kar û berên ne baş û bêt erêni. Bı taybeti li inêj de heya roja iro, kar û berên serok û rêberên gelê Kurd, pırani ne baş û bêt erêni bûne, iro ji dısa serok û rêberên me carna ew kar û berên ew serokên kevn û diroki û feodal dıkın; heta gegana li wan pırr derbaz ji dıbin, hum ji li ev qurna bistan de, ku mirovati êdi derketiye ser esman û hıva qedim.

Xwendevanên xoşewist,

hozanti ji karbendiyek bı taybetiye. Çawa ku herkes nıkarıbe bıbe bıjıjk, sexmankar, hunermendeki nav û deng, her usa ji herkes nıkarıbe bıbe hozan, nıkarıbe bıbe dengê gelê xwe û mirovatiyê. Bı ev gotınan qesta mın ew nine ku ez pesna xwe bıkıım û jı werı bıbêjım " ez hozaneki nav û dengım û dengê gelê Kurdıım, felan, bêvan. Na, ebeden ez ev tıştı nabêjım û ez ew kesa ji ninım. Lê tıştê ku ez dıxwazım bıdıım zanın, ew ji piçeki gırêdayiyê ev karbendiya hozantiyê ye. Hemû hozanên cihan sırûşên -ilham- xwe li bûyer û qewımandınan, li evını, giri, şini û bedbextiyan de dıstinın; evını û bedbextiyên dilê xwe dıkın stran, dıkın dilok, dıkın muzik berdıdıım dıkın devên dengbêj û

stranbêjan. Ew hisên xwe dîkîn helbes pêşkêşe gelê xwe û mirovatiyê dîkîn. Bî kurtasi hozan qet bêt sirûşt nîkarîbe helbest û tîştêki weka helbestan bînvîsîne. Ez bî xwe jî usa me. Mîn beri de jî, lî pîrtûkek xwe de gotibû, iro disa jî ez jî we xwendevanan ra bîbêjîm; ez ne hozaneki nav û dengîm. Lî nav hemû hozanên gelê Kurd de, ez jî hozaneki piçûkîm. Ez hemû sirûştan lî bûyer û qewîmandîman de distînim. Ango her bûyer û qewîmandînek sirûştêki dîke dilê mîn, ez jî lî gor ew bûyer û qewîmandîman, bî xwe bî xwe ra dîkîme mirre-mîrr, lî ew hisên xwe ra meqam û awazekî jî çêdîkîm û helbestan dînvîsînim. Hekê ku ez jî bona bûyer û qewîmandînan awazekî nebinîm, bawer bîn ez nîkarîbîm helbestan bînvîsînim. Ango ez usa helbestan dînvîsînim. Jî bona ev jî, mîn hemû bûyer û qewîmandînen welêt, tevgerên hêzên Kurdistan û tevgerên kesan bî ev şiklî va kîrîn helbest. Pîraniya helbestan dirêjîm; çarîn her zêdene, lê divê hûn jî bona ev mîn bîborînin. Mîn nexwast ku ez bûyer û qewîmandînan nivçe bîhêlinîm.

Belê, mîn lî jor de got, ku mîn lî çarînen xwe de rexneyê serok û rêberên gelê Kurd kîriye. Erê rasti jî ev e. Ev realîta gelê me û serok û rêberên me Kurdane. Lê dil dîxwaze ku êdî serok û rêberên me dev jî ew şaşîti û xehtên xwe berdîm. Wexta ku şaşîti kîrîn jî -ku ev misogere- divê xwe zû serast bîkîm û lêborandîna xwe lî gelê xwe bîxwazîm. Ango çu mirovek sedî sed bêt kêmasî nabe, ev ne keyse jî. Lê mirov ku hewl bîde û bî dil de jî bîxwaze, şaşîti û xelîtan her kêmnî dîke. Daxwaziya gelê Kurd lî serok û rêberan jî ev e. Divê êdî ew xwe serast bîkîm, dev lî şaşîti û xelîtan berdîm, xwe nûjen bîkîm, bîbîn kesên demokrat, kesên gelhez, kesên xoşdîtî. Zira ew lî hember xwe de êdî kesên usa pîrr dîbînin, lî qurna heftan, dewra pêxamberan de, lî dewra Neînrût de jî najîn. Lî Tîrkên esl Moxol û Erebbên

qûmistanan binhêrî û rengên xwe biguhêrînin û rengêki demoqrat û xudan toleransi bîstin. Ango serok û rêberên me ên îroin, ewên rêberên " Rîzgariya Kurdisatan " şaşîti û xelîtên rêber û serokên diroki baş dîzan. Dîvê êdî lî wan dersan bîstin. Dîvê nebîn mîna Îdrîsî Bitlîsî. Weka Yezdan Şêr nekîn, nebîn kesên dozîroş, nebîn Kamûran Înan, Hikmet Çetîn û Zîya Gokalp. Ma heya kîjan rojê em Kurd usa lî bî destên çar dewlet û sê nîjadên har de bîjin? Ma jî mera û ew rêberên mera şerm nîne?. Ango çîye ewqas ezotî û ezotî. Rêber û serokê bî dîl ew e ku bibe rêber û serokeki rastî, mafê gelê xwe bide pêş mafê xwe ê xwanasî, anga şexsî, ku ew kesa bibe rêber û serokê rastî û qedîrbîlînd.

Bî kurtasî ez lî hînin çarînan de hî dîjî bîrakujîya me Kurdan derdîkevîm, rexneyê Celal Talabânî, Mesût Barzanî û Avdîla Ocalan dîkîm. Bî rastî jî hêzên ev kesên gelek xwîna hevûdu rîjandî, bî sedema bîrakujîyê, dijîminatî lî nav gel de her zêde kîrî, ku ev birînan bî hêsa î nayên pêçan û bî hêsa î jî nayên bîrkîrî. Helbet berpûrsiyarê ew bîrakujî jî pêdamn, dîvê em bî tîndî rexneyên ew bîrakujîyê bîkî, dîjî ew tevgerên bê erênî derkevî, ku ew hêzînan jî carek dîn ew karê bê erênî nekîn û nebîn pêşrewê bîrakujîyê. Dîvê ew êdî dest jî rîjandîna xwîna bîratîyê berdî, hêzên xwe hî hember çar dijîmînan bî kar bînin, ku ew serkevî, gelê xwe azad, welatê xwe ê nav Kurdistan jî rîzgar bîkî, dewletek xudan dad, karbîdestek demoqrat damezrînin. Bîla yek bibe " SERKKOMAR " yek jî bibe " SEROK WEZÎR ". Bîla gîramîyê bîdî hevûdu, bîbî hezkîrî û dostên hev, jî hevra bîbî yar, ku bî hêsa î jî dijîmînan ra nebîn nêçîr û gelê Kurd telef nebe.



Xwendevanên hêja,  
divê ji bona ev gotin û şîretên min, hûn min bibaxşinin.  
Zira ez ji Kurdeki welatparêzîm, heqê min ji heye ku ez li  
diji şaşitiyên hêzên Kurdistan û serokên wan hêzan  
derkevîm û rexneyê ew şaşitiyan bikim. Çawa ku hûn ji  
dizanan li ev salên dawî de, angî li piştî sala 1975'an, heya  
sala 1994'an gelek bûyer û qewmandinên bi xwîn li ew  
welatê me ê nav Kurdistan de cih girtin, xwîna deh hezaran  
hat rûjandin. Bi deh hezaran zarok sêwî, xwişk û dayikên  
me ji bi, her hejar, pêrişan man. Angî gelê me ê reben û  
belangaz qet rojek xwe a baş û qenc neditiye. Her tim giri  
û şîn, kuştin û xwîn ji inera bûye xelat. Gelo ev qedera me  
Kurdane?. Na, ez bawer nakim. Her çiqas ku Erdnigariya  
me li cîyeki herî ne baş de be ji, disa sedama ev rewşa me,  
nekoki, çavnebarî û bêt yekitiya ineye. Angî em nebûne  
yarên hev. Pîrr caran em bûne yarê dijminan, me bi destên  
dijminan va birayên xwe kuştine, tola xwe a nalet, a  
feodalîyê standiye. Bi taybetî serokên eşîrên me ev kara  
kirine, lê iro ji disa hin serok dixwazin ku ew karên xwe ên  
nebaş bikim, lê divê em fersendê nedin ew bêbextan. Divê  
êdi em bibêjin " Bese ev xelîtên we, besê evqas bîdestî, bese  
ev xulamî û berdestî, bese, bese ev birakuji ".

Belê, xwendevanên delal,  
êdi ez dawîya ev gotinên xwe binim. Zira zîkê min bi ev  
kulan va tîji bûye, kulan nêmin girtiye, ez naxwazim der  
bikim. Lewra wê her bihn bîdî. Dil û kezewa dayika me a  
nav Kurdistan ji, hezar carî li dil û kezewa min bêtir kul û  
birin bûne, ji bona şaşîti û xelîtên kurê wê ew bûye dayikek  
dîlberin û dayikek bedbext. Angî gelek kurên ew dayikê  
bêbext derketine û dilê dayika xwe dax kirine, bûne yarê  
neyaran, bûne sedama birakujîyê. Ji bona ev bû ku min  
navê ev pirtûka xwe dani " DAYIKA BEDBEXT, EZIM

KURDISTAN ".

Li hêviya bextewariya ew dayikê.

**GAZÎNEK JI BI DIL  
KA KURDISTAN?**

**Lo lo Kurdo, lo lo Kurdo  
Kanê, kanê, ka Kurdistan?  
Alo, Heso, Memo, Cerdo  
Kanê, kanê, ka Kurdistan?**

**Ew diroka hezar salan  
Erd û warê hav û kalan  
Evina kezew û dîlan  
Kanê, kanê, ka Kurdistan?**

**Sıpan û Nemrût, Ararat  
Dicle û Mûrad û Fırat  
Warê Rustem, Şirin, Ferhat  
Kanê, kanê, ka Kurdistan**

**Ava çeman, xezna çıyan  
Delxa deştan lı her çıyan  
Çıra lı dest biyaniyan?  
Kanê, kanê, ka Kurdistan**

**Ew biyanıyên hov û har  
Mina dûpışk û koremar  
Dikujın jin, zarok, dewar  
Lı Kurdistan, lı Kurdistan**

**Ne mal hiştın, ne rez bostan  
Şewitandm dar, darıstan  
Her der kırım gor, gorıstan  
Lı Kurdistan, lı Kurdistan**

Pırs ke bıra çıye ev rewş  
Hat serê te tu may bêt tewş  
Te nedit havilek qenc baş  
Bo Kurdistan, bo Kurdistan

Ma çıra tu bûy derbeder?  
Kanê Ala kesk û sor zer?  
Te nedit pêşrewek, rêber  
Bo doza Kurd û Kurdistan

Ew welatê Mem û Zinê  
Wek bihişt bû jî bo jinê  
Îro bûye gola xwinê  
Ew welatê Kurd, Kurdistan

Bihiştê Kurd bûye dojah  
Hemû zindan û girtigeh  
Gund dijmin ra bûne wargeh  
Lî Kurdistan, lî Kurdistan

Kê da dest sê hovan bihişt?  
Wana xurand tıştek nehişt  
Xıstın dilê Kurd tir û xışt  
Lî Kurdistan, lî Kurdistan

Gazi hemû cihan dıkım  
Wek mirovek loman dıkım  
Rewşa Kurdan berçav dıkım  
Dibêm kanê, ka Kurdistan?

**Pîrsa mîn mirovhezan ra  
Demoqrat û xêrxwazan ra  
Hemû serok rêberan ra  
Kanê, kanê, ka Kurdistan?**

**Lo lo giregirên mezîm  
Kurd mirovî, ew ne pezîm  
Heq û mafên xwe dîxwazîm  
Heq û mafê Kurd, Kurdistan**

**Hûn dibên " Em mirovhezîm  
Cihan de şeran naxwazîm "  
Ma Kurd bo we dewar, pezîm?  
Dîkîm qurban Kurd, Kurdistan**

**Çîra hûn wer bûne çav kor?  
Qet nabinî ew xwîna sor  
Fîrokên Tîrk, Ereb lî jor  
Bîm homban de Kurd, Kurdistan**

**Mala we xîrab be lo lo  
Hûn nabinî Hes û Elo  
Gû dîdîm bî xwarîm kalo  
Ka dada we bo Kurdistan?**

**London û Paris û Waşîngton  
Mîterant, helmont Cîlînton  
Yetskîn û Peng, Hoka û Con  
Ew nabinî qet Kurdistan**

Lı pês çavên ew bêbextan  
Si milyon dıxwın ço zextan  
Kurd şikeft, ew lı paytextan  
Djin, nabinın Kurdistan

Ew welatê hezar salan  
Bı destên ew Emperyalan  
Çar har hovan ra bû talan  
Ew erd warê Kurd, Kurdistan

Wan jı bona ew zêrên reş  
Kurdistan fırotın beleş  
Çar har xwe ra kırım keleş  
Dan destên wan Kurd, Kurdistan

Şêlandın ser erd û bın erd  
Gelê Kurd kırım xudan derd  
Tev Tırk, Ereb, Fars'ên namerd  
Wêran kırım Kurd, Kurdistan

Wan çar perçe kır ew welat  
Jı hovan ra kırım xelat  
Agırek berdan Rojhilat  
Bona pırsa Kurd, Kurdistan

Divê ew pırs safi bıbe  
Rojeki zû, iro sibe  
Ku ev nebe, aştı nabe  
Hım cihan de, hım Kurdistan

Ew nabinın rewşa ew gel  
Pışt dıdın Çiller, Demirel  
Saddam, Rafsancani lıgel  
Betal dıkın, Kurd, Kurdistan

Kê ew sinor wer xêz kırım?  
Bı bêbexti pêdan kırım  
Dan dest hovan radest kırım  
Ew erdê Kurd û Kurdistan

Çiye ew " Misaki Mili?"  
Dıbêjın keçel û zilli  
Tırkên har gırtın her ali  
Dışêlinın Kurd, Kurdistan

Ev gotınên Rızê Guran  
Bo ev cihan, bo xwişk bıran  
Taybeti bo gıre-gıran  
Jı bona Kurd û Kurdistan

31-10-1993

**ÇARİNÊN ŞİRETAN  
JI BONA PKK  
KURD Û KURDISTAN**

L o lo birano ev xelit bese  
Çiye li dest we, ew çekûç dase?  
Şer ne liztike, ne ji reqase  
Jı bona pırsa Kurd û Kurdistan

Xwe li çewtiyan liûn zû felat kın  
Ala kesk û sor, zer, sıpi rakın  
Kesên ne wek we caş êlan mekın  
Eva ne qence bo Kurd, Kurdistan

Welat vala bû mirov naminın  
Ma çira liûn ev rewşê nabinın?  
Ew erdên evrar bêt kes dıminın  
Bêt mirov dıbe welat Kurdistan

Milyonan bazda ew çûn Rojava  
Hûn mın ra bêjın, çend kes man şuva?  
Bı ev rengi va kar naçe rêva  
Ew riya doza Kurd û Kurdistan

Hûn çek dıqşının zarok û jınan  
Nabinın Hikmet, Kamûran İnan  
Wek bêt aqılan, har hov û dinan  
Dıkujın jın zarokên Kurdistan

Ma hûn nabinin wan xayin, çaşan?  
Hûn dibên " emîn mêrxwas û rêşan "  
Hejar rebenan dîkîn pêrişan  
Ev zef xesere bo Kurd, Kurdistan

Divê dara jehr bîn da jêbibe  
Ku ew aj nede, sibe, dusibe  
Ev kari bîkîn gel we şa bibe  
Ew gelê me ê Kurd û Kurdistan

Hûn dibên " çêley Mar bêt jehr nabe "  
Ma mirov Mare, ser lîng ranabe?  
Ev fels bêt hime, pê bawer nabe  
Karê wer mekîn bo Kurd, Kurdistan

Ew segên gundan xeşim, nezanin  
Liztokên dijmin, kedxwar, dîzanin  
Bîrçî, tazine, tîşteke nîzanin  
Evan birmekîn bo Kurd, Kurdistan

Bûne parêzkar jî bo parîk nan  
Ew kesên hejar, şivan û gavan  
Ma çira nabîn zana, xwendevan?  
Lî ev bînhêrîn, bo Kurd, Kurdistan

Kesên ku wek we cihan nanhêrîn  
Hûn dibên " xayîn " cezandîrîn  
Poz bîlînd bûne, bîlînd dîrîn  
Ev jî ne qence bo Kurd, Kurdistan



We gelek kesên bêt guneh kuştin  
Lı paşva giri, şin histêr hiştin  
Kesên rexnegrî we qet nehiştin  
Ew wenda bûn çûn bo Kurd, Kurdistan

Hûn dibên " tenê emîn û emîn "  
Bawer kî ev a xeyal û xemîn  
Xêncî we hene kek birayên mî  
Jî bona doza Kurd û Kurdistan

Çavên xwe vekî, dor xwe mêze kî  
Yar û neyaran lî hev cûda kî  
Ew navê ne baş lî ser xwe rakî  
Jî bo xwatrê Kurd û Kurdistan

Cihan jî wera " Terorist " dibê  
Her dem her seat, êvar û sibê  
Lê ev ne rastê, dost usa nabê  
Jî bo tevgera we a Kurdistan

Lê divê hûn jî xwe serast bîkî  
Rojek zû ew nav lî serxwe rakî  
Yekiti çêkî, dilê gel şakî  
Ku rîzgar bîkî hûn Kurd, Kurdistan

Jî bo ev kari gavan bavêjî  
" Em her mezîna " çucar mebêjî  
Ku xwîna xortan ewqas nerjî  
Jî bona şerê Kurd û Kurdistan

Tenê serê xwe şer tevger mekîn  
Bı ev felsê va qet tıştek nakîn  
Ev bar girane, tenê ranakîn  
Bawer bın jı bo Kurd û Kurdistan

Eniyek çêkîn tev hemû hêzan  
Tev kesên zana, tev kesên rêzan  
Ku usa nebe, gel lı dest dızan  
Pêrişan dıbe ew lı Kurdistan

Bawer kın derman, havıl ev tışte  
Bıxınin dilê dijmin tir, xışte  
Fersend çêdibın, ewan rahişte  
Ku felat bıbe Kurd û Kurdistan

Gırami bıdın ramanên cûda  
Mebên" em rastın, her tışt lı cih da "  
Çewtin ji hene, jin û jiyan da  
Evan bızanin bo Kurd, Kurdistan

Jı xwe birmekın yek dengi çı bû  
Hılşiya nema, hemû xırab bû  
Meydana sor de Lenin ranebû  
Ev bıbe minak bo Kurd, Kurdistan

Bı zorê kesek nabê Kominist  
Dawiya zoran cihan dit bıhist  
Xwe zû guhartın kesên têgihışt  
Bıbinin ewan bo Kurd, Kurdistan

Gelê Kurd çawa bibe Kominist?  
Çito ew birkin dojeh û bihişt  
Evan zanibin mebin egoist  
Jı bona gelê Kurd û Kurdistan

Ma gelo çito sazbe ew rejim?  
Birbibe Allah, wallahi lazim  
Ku nımêj nekın Omer û Kazım  
Lı ew mızgeftên Kurd û Kurdistan

Hûn qet nabinn ew şêx û melan  
Seyid û miran, paşverû belan  
Çanda feodal a hezar salan  
Binın ber çavan bo Kurd, Kurdistan

Binın bira xwe bajarê Wanê  
Meha rojiyê a Remezanê  
Kesek nıkare vexwe av demê  
Lı ew welatê me, Kurd, Kurdistan

Lı zaningan de xort têne kuştın  
Bo roji, nımêj, we ew bihistın  
Bawer'ya gel ra naye leyiztın  
Jı xwe birmekın bo Kurd, Kurdistan

Ew kar her zore, zeman dixwaze  
Karê perwerde, her her nêmaze  
Gelê Kurd bindest, ew tişt naxwaze  
Evan birmekın bo Kurd, Kurdistan

Ew gel dixwaze olkên bîndesti  
Bîçirine ku bîbe serbesti  
Kêr goşt bîriye xwe daye hesti  
Bo ew kar bîkîn, hûn lî Kurdîstan

Gelê me şivan, cotkar rêçbere  
Bêt sazgeh dewlet, her derbedere  
Bîn zîlm zorê de maye bêçare  
Evan bîbinîm bo Kurd, Kurdîstan

Bawerya Oli nav gelê meda  
Her roj gurr dîkîn lî malên meda  
Hîm lî ber çavên cihan û weda  
Bîbinîm ev tîşt bo Kurd, Kurdîstan

Nav gel de zêde dîbîn tariqet  
Eva rastiye, ev e heqîqet  
Gel dîn gêj bûye, tune marîfet  
Ev rewş bîbinîm bo Kurd, Kurdîstan

Yek deng, yek Parti êdî qet nabe  
Lenin ew mîr çû, lî cih ranabe  
Lî dest zordestan kesek şanabe  
Evan bîrmekîm bo Kurd, Kurdîstan

Lê divê her tîm berberî hebe  
Ku mîrov pêşva bîçe û fêrbe  
Jîyan du alî, yek alî nabe  
Fêrbîn kekên mîm bo Kurd, Kurdîstan

Pırr dengi xweşe, pırr rengi xweşe  
Yek deng û yek reng, ne qenc, ne başe  
Her renek bî xwe neqış neqîşe  
Wê bixemline Kurd û Kurdistan

Rewşa Kurdistan binın ber çavan  
Lî gor ew rewşê qenc bavên gavan  
Ku hûn dîlşa kın dayik û bavan  
Ew bav dayikên Kurd û Kurdistan

Ku hezar salın ew şêr bîndestın  
Hejar pêrişan, reben berdestın  
Lî ser wan rovi, tori serdestın  
Dîşêlinm ew Kurd û Kurdistan

Malzeme medın dewleta Romê  
Qet bawer mekın Tahran û Şamê  
Dijmın dijminın ew nayên ramê  
Jî bona gelê Kurd û Kurdistan

Evan hesab kın, hûr hûr mêzekın  
Dirokê vekın bî qenci sekın  
Çar har nabın dost, lî mın bawerkın  
Ewın neyarê Kurd û Kurdistan

Wana perçe kır erdên Kurdistan  
Ew erd jî mera kırın goristan  
Şewtandın delx û dar û daristan  
Tevda pag kırın Kurd û Kurdistan

Dev sıloganên bê kêr zû berdın  
Dostan ra mebên " hûn çaş namerdın "  
Ew bırakuji dubar carek dın  
Mekın jı bona Kurd û Kurdistan

Dijının jı evan, maf, kêr dıstının  
Tevgera welêt jar, sıst dıxının  
Dêrsım, Şêx Said dersan bıstının  
Bo felatbûna Kurd û Kurdistan

Jı ber ku ew hêz hevra yar nebûn  
Lı hember dijmin tenê man têk çûn  
Jı bona ew jı nehat Serxwebûn  
Ew Serxwebûna Kurd û Kurdistan

Bı aqıl karkın, hûn bıbın rêzan  
Zora me naçe hın gelek hêzan  
Jı wer a dıbê Kurdeki hozan  
Jı bona doza Kurd û Kurdistan

Gelek tışt êdi bûne kılasic  
Hûn bıbın hosta, bıbın mekanik  
Her pêşva dıçe zanin û teknik  
Evan birmekın bo Kurd, Kurdistan

Raste pırr hene kedxwar, Emperyal  
Lı ser pırê de hırçê bıkın xal  
Derbaz bın dûra bıbın Rustem ZAL  
Bı aqıl bıbın bo Kurd, Kurdistan

Tahran û Bexdat, Şam û Anqara  
Bo pırsa Kurdi kar dıkın hevra  
Lı hember ewan dost divêt mera  
Jı bona pırsa Kurd û Kurdıstan

Amrika, İngliz, lı tev Elmanya  
Fransa, Swêd, Norweç, İtalya  
Şert nine em wan bıkm diji xwa  
Jı bo rızgar'ya Kurd û Kurdıstan

Holanda, Ūrız, Çin û Japonya  
Ew lı tev hevın, wek çem û derya  
Ligel ewana, Yewnan, İspanya  
Nasbike ewan bo Kurd, Kurdıstan

Ew ku nebêjın " gelê Kurd heye "  
Her vala dıçe xwina mın teye  
Bawerkın bıra ev rewş usa ye  
Jı bona gelê Kurd û Kurdıstan

Em bibên nebên ew her gewrene  
Lı pêş pırsan de derd û belane  
Şûr lı dest wan de dıkın fermane  
Jı bo ev cihan, bo Kurd, Kurdıstan

Şûrê lı dest wan, bombe Atom'ın  
Çekên kimyewi, Fırok, Fantom'ın  
Jı bo mafên xwe ew dın û bom'ın  
Evan birmekın bo Kurd, Kurdıstan

Îro zemanê şûr mertal nine  
Ku bavên Atom namine jine  
Mêr û mêrxwasi tîlî pêçine  
Evan zanîbîn bo Kurd, Kurdistan

Rastiyên ber çav, ên iro evîn  
Emperyal mezûn wek hût û dêvîn  
Em qet nîkarîn dij wan derkevîn  
Wan ra şer bîkîn bo Kurd, Kurdistan

Dîvê em iro dijî Rojava  
Qet dernekevîn, qenc nine hewa  
Ku usa nebe, kar naçe rêva  
Kar karê pîrsa Kurd û Kurdistan

Dîvê em wan ra bîbîn heval dost  
Ku felat bîkîn beden çerm û post  
Welat şên geş be, delx dirêj bost bost  
Bîbîn ser erdê Kurd û Kurdistan

Bawerîm her tîşt ew safî bîkîn  
Sinoran nûva ew pêdan bîkîn  
Pîrsa Rojhîlat çareser bîkîn  
Lî tev Filistin, a Kurd, Kurdistan

Jî ber ku mafên wan ev de heye  
Bo nîftê pîrsa Kurd ne cûda ye  
Rewş lî ber çavan usa xuyaye  
Jî bo Rojhîlat, bo Kurd, Kurdistan



Jı bo ev dıbêm em rêzan bıbın  
Serkevm ne ku em betal bıbın  
Xudan dewlet û war dezgeh bıbın  
Lı ser ew erdê Kurd û Kurdistan

Bı dest maçkırın dev qılêr nabın  
Birbinın ev tışt bese şıyarbın  
Dereng meminin, lı cih de rabın  
Ev kari bıkın bo Kurd, Kurdistan

Ez zef hezdıkım Marks û Marksızım  
Ew bo me nabe, wera dıbêjum  
Jı bo ev rojê, sıbe nabêjum  
Ew rejim jı bo Kurd û Kurdistan

Dıvê evana hûn qenc berçav kın  
Kiye gelê Kurd, ew geli naskın  
Bo şert û şûrtan tıştan daxwaz kın  
Jı bona gelê Kurd û Kurdistan

Ez pêşverû me, çep û Marksistım  
Mın Marks xwendıye piçek têgiştım  
Jı bo gelê xwe dılsoz dırıstım  
Gelê mın gelê Kurd û Kurdistan

Çıye ew navê Proleterya?  
Ew nav nızane Zin, Mem û Wurya  
Qet kes naxwaze zılm, diktatorya  
Hum ev cihan de, hum lı Kurdistan

Lı milê dın de werım ser zıman  
Ew çı tevgere, çiye ew raman?  
Bı Tırki derbaz dıkın hûn zeman  
Eva her şerme bo Kurd, Kurdistan

Hûn qet hewl nadın ser ev babetê  
Zımanê daykê, bav, xalti, metê  
Şev roj kar bıkın, çıqas dest we tê  
Jı bo zımanê dayka Kurdistan

Jı bona ev ji, ez tûj dibêjım  
Bawer bın ez ne, dınım, ne gêjım  
Rexney we dıkım, wera dibêjım  
Fêr bıbın zıman, bo Kurd, Kurdistan

Hûn lı nav xwe de Kurdi kar naynın  
Zıman gırıngê ev a birbının  
Lı ev ali de paşva dımının  
Jı bo zımanê dayka Kurdistan

Cıvinên weda zıman Tırkiye  
Pırs dıkım lı we sedem ev çiye?  
Ev tevger wera şerme, fedıye  
Jı bona pırsa Kurd û Kurdistan

Hemû nav weda, ew " Gel û git'e "  
Nızam lı dilê weda çı nête  
Alıya zıman de nakın qêrete  
Jı bo zımanê gelê Kurdistan

Hûn dibên " Zıman pırr giring nine "  
Bawer bın himê ev raman tune  
Gelên bê. zıman wek jnên bi ne  
Lê bê. mêr nine dayka Kurdistan

Şertên Netewi yek ji zımane  
Hım ji her giring, ê her girane  
Şiretên mın lı we xwişk birane  
Ev a birmekın bo Kurd, Kurdistan

Zımanê Kurdi her dewlemende  
Derya Okyanûs, bedew, çelenge  
Mina kulilkên Sipan reng, renga  
Her dıneqşine Kurd û Kurdistan

Zımanê Tırki, zıman ki pince  
Hûn ew kar tının, wera ne qence  
Ma ew zımana şekır, pırınce?  
Ewqas jı wera bo Kurd, Kurdistan

Wêşanên we ji hemû Tırkine  
Ma em Kurd Tırkın, Moxol'ın kine?  
Karên mirovan neynık mizine  
Evan birmekın bo Kurd, Kurdistan

Mın jor de qala Bexdat û Şam kır  
Tahrán, Anqara ani berçav kır  
Çewtiyên we got, lı we şiret kır  
Jı bona pırsa Kurd û Kurdistan

Lı vır vegerım ser rewşa dijmin  
Wan kêr xençer day ser cigera mın  
Çavên xwe vekın, guh bıdın ser mın  
Wera çı dibêm bo Kurd, Kurdıstan

Jı xwe birmekın bı çekên dijmin  
Qet felat nabe welatê we û mın  
Dıwayên pûç ra kes nabê " Amin "  
Jı xwe birmekın bo Kurd, Kurdıstan

Çucar nabe dost ew Hafız Esat  
Ew ehrimane, bêbext û fêsat  
Jı wi mexwazın irfan û irşat  
Jı bona doza Kurd û Kurdıstan

Ew ji dijmine mera nabe dost  
Çermê berazan nabın meşk û post  
Ma kê ditiye guni bûye bost  
Eva birmekın bo Kurd, Kurdıstan

Geli a Beka Kurdıstan nine  
Ew erdê Ereb, bêbext dijmine  
Bese nasbıkın dostên Kurd kine  
Jı bo xwatırê Kurd û Kurdıstan

Ser erdên dijmin we kon danine  
Lo ev çı felse, ew çı zanine?  
Dıvê hûn naskın Ereb, Fars kine  
Jı bona pırsa Kurd û Kurdıstan

We hefsar daye dest Esat, Saddam  
Mebên " Ew dostin, ew eslên Adam "  
Aqıl bîde we Xızır û Xudam  
Jı bona doza Kurd û Kurdistan

Ne Hafız, Saddam, ne Rafsancani  
Nabın dostên Kurd cihan dızani  
Yani, Yami ye, qet nabe Kani  
Eva birmekın bo Kurd, Kurdistan

İcar dagerım ser hın meşên we  
Mın qet fêm nekır ew tevgerên we  
Lı Kurd xweş nayê ew deng sewtên we  
Bawer kın bıra bo Kurd, Kurdistan

Meşên we meşên Kurdan neçûne  
Jı ber ku tev da hûn Tırkan çûne  
Tırki dıqirin, wek Tırkan bûne  
Ev ji her şerme bo Kurd, Kurdistan

Meş, tekoşinên weda Ala sor  
Tev potrey Apo, radıbın her jor  
Sıloganên we" Vûr gerila vûr "  
Ma usa dibe bo Kurd, Kurdistan?

Çiye " Gêrila ?" Em Pêşmerge ne  
Lı Xwedê şıkır navên me hene  
Jı bo ev navi me zef can dane  
Jı bona erdê Kurd û Kurdistan

Dibêjîm wera, Apo mekî n pût  
Jî bo ew gelê tazi, birçî rût  
Ocalan nine Mîstê Kor, Nemrût  
Jî bona gelê Kurd û Kurdistan

Binî ber çavan heykelên Lenin  
Hemû deran de tev ê Stalin  
Hatî şikandî, cihan pêkenî  
Evan birmekî bo Kurd, Kurdistan

Lî nuva rûnî, rewşê mêzekî  
Hûr hûr hesab kî, xwe ber nûjen kî  
Bese xelîtan hûn dubar mekî  
Jî bo tevgera Kurd û Kurdistan

Dibên " Kesên dost tûj dîaxîfî "   
Jî ber ku dîlsoz, zana, Arif'î  
Ez dostê weme, hûn her her heyfî  
Mekî xelîtan bo Kurd, Kurdistan

Ez wek bîraki we rexne dîkî  
Çewtîyan yek-yek qenc berçav dîkî  
Lî we tîka û şîretan dîkî  
Jî bona doza Kurd û Kurdistan

Rîza Çolpan'î, usa dibêjîm  
Hûn tevda " şaşm " werge nabêjîm  
Mî nî xwast evana wera bîbêjîm  
Jî bona pîrsa Kurd û Kurdistan

17-11-1993 Sydney

## BESE, BESE BIRAKUJÎ

Bıra Apo, bıra Mesûd  
Bese, bese bîrakuji  
Hevra mebın dijmin, hesûd  
Bese, bese bîrakuji

Çar dijmin we berdîdın hev  
Xebat dıkın bı roj û şev  
Bı wêşanan, hım ji bı dev  
Bese, bese bîrakuji

Hûn bı liztıkên dijminan  
Mîna har û hov û dinan  
Dirjının xwina bıran  
Bese, bese bîrakuji

Hûn jı hevra dibên " Xayin "  
Hev dıkujın, dirjının xwin  
We kır nav gel giri û şın  
Bese, bese bîrakuji

Rojên çûyi ders bîstının  
Ku hûn riya qenc bıbının  
Ew rıkê dilda derinın  
Bese, bese bîrakuji

Qet mebın liztokên Romê  
Ê Tahran û Bexdat Şamê  
Mekın dılan derd û xemê  
Bese, bese bîrakuji

Ma hevkuştin hûn têr nebûn?  
Bî fêlên dijmin fêr nebûn  
Hezar car hûn dij hev rabûn  
Bese, bese bîrakuji

Xwina bîran we pîrr rîjand  
Dayikan ra nûça reş şand  
Guh nedan şîretan, nexwend  
Bese, bese bîrakuji

Ew karên we efû nabîn  
Kulên dîlan derman nabîn  
Bî ev tevger Kurd şanabîn  
Bese, bese bîrakuji

Hûn serokîn, berpîrsiyar  
Çîra dîdîn werge bîryar?  
Bîran hevra dîkîn neyar  
Bese, bese bîrakuji

Weka bîran gelhev rûnîn  
Hûn şareza, ne hov dînîn  
Lîhev werîn, xwîn merjînîn  
Bese, bese bîrakuji

Ma lî ew kar kî şadîbîn?  
Sermest û her kêfxweş dîbîn  
Bîbînîn ev şîyar bîbîn  
Bese, bese bîrakuji



Hûn karên dijmin pêk tinin  
Dılşabûna wan nabinin  
Tevgera Kurd jar dixinin  
Bese, bese birakuji

Bese êriş medın ser hev  
Bı fiziki, wêşan bı dev  
Lı hev mepên hûn roj û şev  
Bese, bese birakuji

Heqê we tune ev bıkın  
Tevgera Kurd jar, sıst bıkın  
Kurdan bı Kurd telef bıkın  
Bese, bese birakuji

We bı hev sedan kes kuştın  
Zarok sêwi, jın bı hiştın  
Dılan de aram nehiştın  
Bese, bese birakuji

Berdın hisên feodali  
Ew gemarên hezar sali  
Bermedın hev Hesoy Eli  
Bese, bese birakuji

Hûn wek serokên eşiran  
Dij hev rêz dıkın bav, bıran  
Tinın cih karên neyaran  
Bese, bese birakuji

Ma hûn Parti, axa, mir'ın?  
Xudan mirûd, Şêx'ın, Pir'ın?  
Ku mirûd ho we bımırın?  
Bese, bese bırakuji

Navên we partiyên rêzan  
Lê we hevdu day ber gezan  
Lı hember çar dijının, dızan  
Bese, hese bırakuji

Hım ji Demoqrat û Karker  
Lê hûn gel dıbinın noker  
Gelhez nının hûn gunekar  
Bese, bese bırakuji

Ku wer nebe hûn ev nakın  
Dılê gelê Kurd dax nakın  
Jı hevdura dest ranakın  
Bese, bese hırakuji

Dostên we Tahran û Şam e  
Saddam ê faşist bêt rame  
Demirel, dewleta Rome  
Bese, bese bırakuji

Bi ev karên we şerm dıkım  
Dıgirım dılde xem dıkım  
Wek bıraki bang we dıkım  
Bese, bese bırakuji

**Kurd xemgînın bo ev tevger  
Dîşewtînın kezew, ciger  
Wek we nabın serok, rêber  
Bese, bese bırakuji**

**Dirok lı we nalet bıke  
Kesek ramet lı we neke  
Bı çêr dev jı wera veke  
Bese, bese bırakuji**

**Gazi hemû hêzan dıkım  
Dılda tıka, lava dıkım  
Hezaran car dubar dıkım  
Bese, bese bırakuji**

**Ev şîretên Rızê Guran  
Werın gelhev wek du bıran  
Reş bıkın dılên neyaran  
Bese, bese bırakuji**

**21-11-1993 Sydney**

## KESÊN GEMARÎN

Navê Kurd bûye ticaret  
Lı dest kesên bêbext, sosret  
Roj bı roj ew dıkn qêret  
Bo mafên xwe ên gemarin

Jı bona mafên şexsên xwe  
Bed dıkn navê qewmên xwe  
Ku keys be jin, dayikên xwe  
Bıfiroşın ew gemarin

Devên wan de Kurd, Kurdistan  
Dılên wan de gemaristan  
Her dırın dilsoz, dırıstan  
Ew mafperestên gemarin

Dıxwazın ku bıbın rêber  
Gel jı xwe ra bıkn noker  
Cem wan herkes bıbe lal, kerr  
Ku serkevın ew gemarin

Pırr hezdıkn pesn, çepıkan  
Lı gelên xwe ew henıkan  
Dıkn mina har dınkan  
Ew kesên bêbext gemarin

Cem mêran de wek Melek'ın  
Paşva şeytanê kulek'ın  
Bı derewan her zirekın  
Ew kesên bêbext gemarin

Dîbên " Em hozanî, emî Şekspir "  
Dîxwazî ku bîbî Şêx, Pîr  
Xwe dîbînnî zana û jîr  
Ew kesên bêbext gemarî

Xwe pîspor dîhesîbînnî  
Bo xwenasê bodle dînnî  
Xwe lî ser esman dîbînnî  
Ew kesên bêbext gemarî

Pîrr nexwaşî bo mîkrofon  
Dîxwazî her der dayînnî kon  
Dîbînnî xwe wek Cîlînton  
Ew kesên qure gemarî

Torî bûne şêr, pîlîng, baz  
Wek Koroxlû, mîna Aywaz  
Lîgel kesên her belengaz  
Qure bûne ew gemarî

Bî Video kasetan va  
Name şandî, gotaran va  
Werge xebat dîbînnî rêva  
Kesên derewçînnî, gemarî

Dîbînnî Amed'î, Sorekî  
Yîlmaz Guney, Emin Zekî  
Hezar derewan carekî  
De, dîbêjînnî ew gemarî

Dixwazın ku herkes cem wan  
Dest pençe bın lı hember wan  
Ew xwe zana, gel jı gavan  
Dıbinın kesên gemarin

Lı her der de şiretkarın  
Dibên " Em axa, zanyarın "  
Şeytan, Rovi, koremarın  
Ew kesên bêbext gemarin

Ligel kesan de rûkenın  
Paşva tınazkar, nakenın  
Stûr çêkın, hûr dijenın  
Ew kesên bêbext gemarin

Rıza me ez wan nas dıkım  
Rewşa wana berçav dıkım  
Lı wan her her ikra dıkım  
Ew kesên bêbext gemarin

20-12-1993 Sydney

**BANG Û GOTINÊN  
PÊŞMERGAN**

Ser çîyan de nayê m xar  
Heta neçe der neyar  
Çek û tîfing bernadim  
Jî bo dijminê xwinxwar

Ez pêşmerge, şervanîm  
Canfida me, sevkanîm  
Canê min qurban welêt  
Ez kurê Kurdistan'im

Çar hov û çar dinên har  
Bûne weka koremar  
Jehr berdane canê me  
Wan xwinmijên koledar

Türkiye, Iraq, İran  
Ew mera nebûn ciran  
Qir û koka me anin  
Mîna hirc, torî, guran

Dagîr kîrîm warên me  
Ağîr berdan canê me  
Kurdîstan wêran kîrîm  
Nehîştîm hebûnên me

Dêrsûm, Axrî, Şêx Sait  
Ew tevgerên her eğî  
Em wana qet birnakîn  
Ta ku çavên me tol dit

Sonda me a serxwebûn  
Em mêr jin tevda rabûn  
Bo welat em şer dîkîn  
Eve, ev mera şabûn

Çito birbe HELEBCE?  
Ew kin dîlan da naçe  
Pênc hezar ew cangori  
Çawa biran da bîçe?

Em ne hov êrişkarin  
Ne ji dinin, ne harin  
Heqên xwe em dîxwazîn  
Ji bo ev zare zarin

Doza me heqê meye  
Kurdistan warê meye  
Ji bo wê em ketin şer  
Lewra ew diya meye

Ji bo wê em şer dîkîn  
Ne ku em şer hezdîkîn  
Em dîxwazîn aşiti  
Bo ev kar qêret dîkîn

Lê dijminên dagîrker  
Ew gurr dîkîn pevçûn, şer  
Wek vampiran xwinmijîn  
Ji bo xwinê naçin der



Jı bo ev me çek stand  
Me sond xwar û me sond xwend  
Me got " ya mırın mayın "  
Ev nûçe dijmin ra şand

Mırın bo me evrare  
Jı mera doz û kare  
Jiyana bêt rûmeti  
Mırov ra zıqım dare

Bo parastına welat  
Mırın mera wek xelat  
Dibe, divê çar dijmin  
Ev nazıbın pis nalet

Hezar salın ku dijmin  
Dıkujın mêr, zarok, jin  
Me got " Ev êdi besê "  
Usa naçe jiyan, jin

Jiyan tım berxwedan'e  
Şirine, êş û jane  
Bo mirovên têgihişt  
Mırın nabê bêt mane

Kurdistan canê meye  
Xwişk û dayika meye  
Canê me qurban wê be  
Ew ruh bedana meye

Çar dijmin ev zambın  
Kurd bêt Kurdistan nabın  
Sond û soza me ev e  
Bıla bıçın zû rabın

Jı ber ku ew war û ax  
Çem û çıye, rez û bax  
Ew mal û mîlkên mene  
Lı tev kele, qesr qonax

Lê Tırk, Ereb û Farıs  
Bı gule û bı weris  
Me qır û darda dıkın  
Nabine, London, Paris

Waşington, Bill Cılnton  
Lı tev Tokyo, lı tev Bohn  
Ew hember mêze dıkın  
Tev Miterand, Helmût, John

Em gazi cihan dıkın  
Tıka û lava dıkın  
Êdi bese rojek zû  
Ev birin derman bıkın

Em naxwazın xwina sor  
Bırıje lı hawirdor  
Em mirov ne heywanın  
Çıye giri, şın qar qar?

Ma ev cihan jî mera  
Bes nine mîn û tera?  
Ev çî kuştin, çî şere?  
Şerme qûlên Xwedê ra

Lê kedxwar û hov û har  
Jiyan ra bûne neyar  
Naxwazîn aşiti be  
Bûne dûpîşk, bûne mar

Jehr axû belav dîkîn  
Şowanizmê lûl dîkîn  
Dîjî dost bîratine  
Gelan dij hev rêz dîkîn

Hejaran berdîdîn hev  
Bî çek tîfîng, çêr û dev  
Reben li dû wan dîçîn  
Her kelecân, bez û rev

Mebên gelo hûn çine  
Axa, begên we kine  
Erê her raste ev pîrs,  
Yên mera tune jine

Em caşan Kurd nabimn  
Wan wek dijmin dîbinm  
Ew tev dijmin kar dîkîn  
Her tum cem wan dîminn

Axa, beg û mir'ên me  
Ew şer dîkîn lîgel me  
Lî tev me ew dîmîrîn  
Lewra yeke doza me

Bînêrîn Mesût, Celal  
Ocalan, Hicri, Kemal  
Bî salane şer dîkîn  
Bo Azadi, nan û mal

Em, ew dîxwazm bîjin  
Tev dayik, bav, zarok, jin  
Em cihan tîka dîkîn  
Kurd " Terrorist " nebêjin

Em dehe, bist kes nînin  
Mafia, Korsan nînin  
Em Netewk Si Milyon  
Sed kes û etnik nînin

Em dîxwazî erdê xwe  
Çand, zuman, welatê xwe  
Malên kesi naxwazî  
Dîxwazî em heqên xwe

Em pêşmerge yê Kurdan  
Kurê Lûr, Guti, Med'an  
Gazi ev cihan dîkîn  
Bese ev kuştî, lêdan

**Dengê me Rîzê Guran  
Bo cihanê, bo bîran  
Herkes jî bo bîrati  
Zû kar bike, ne gran**

**25-12-1993 Sydney**

## KURTE JİYANA MIN

Lı Kûpikê dûrketım  
Mın xwatır xwast rêketım  
Ez sêzdeh salin de bûm  
Wek kereng ber ba ketım

Ew Kûpık gundê mine  
Bihišta jina mine  
Ez lı ser erdê wê bûm  
Ew erd can ruhê mine

Hezar neh sed û pêncê  
Ew biranin ne qence  
Lı ew sal gund derketım  
Mın paşva hişt genım, ce

Vebû riya qurbetê  
Ciyê êş û hesretê  
Dıl kezewa mın dax bûn  
Ketım binê kulfetê

Ketım kûçan, bajaran  
Wek bêkesan, hejaran  
Tazi, birçi geriyam  
Lı ber çavên neyaran

Ew neyar ji Tirkên har  
Qewmê zalım û barbar  
Lı ew welatê meda  
Nehiştın em bıkın kar

Hım xeşimi nezani  
Bêt perwerde xızani  
Lı ber zılm, hejariyê  
Me cihîşt war û bani

Em du xwişk, heft bıra bûn  
Qet em lı hev şanebûn  
Wek kûçik û pısikan  
Lı dıji hev radıbûn

Sedem ji nezani bû  
Ew rewşa xızani bû  
Me qedra hev nedıgirt  
Dijmın lı ew şadıbû

Me hevdu hez nedıkır  
Dılên hev şa nedıkır  
Bırayê minê mezın  
Her roj min ra şer dıkır

Lı ber çavên cıranan  
Bıray min Husê Guran  
Bı çêr û leqem, lêdan  
Ez dıkutam wek haran

Ew bûbû neyarê mm  
Gıran dıkır barê min  
Jıyan ber dijwar dıbû  
Her teng dıbû warê min

Jı bo ew min xwatur xwast  
Paşva hişt toraq, dew, mast  
Lı qurbeta malşewat  
Bı salan kar neçû rast

Ez birçi mam, ez bêt kar  
Bêt welat û him hejar  
Lı parkan de raziyam  
Mın ra dojah bûn bajar

Lê kes nebû arikar  
Nebûhist qirin, hawar  
Jinê ra mın şer dıkar  
Tunebû dost, heval, yar

Ez bûm hemal, ez barkêş  
Mın kışand derd, kul û êş  
Lê lı Xwedê her şıkar  
Ez nebûm bed, esrarkêş

Dojah bûbû İstembol  
Pine bûn şal, kurtık, sol  
Kursi mın ra bûn nivin  
Şadeye Mıstê Xolxol

Rojek dewleta Romê  
Ez girtım kırım gomê  
Sê sal mın leşkeri kır  
Lê kes mın ra nat ramê



Çûm Qıbrîsê zewicim  
Mın birkır cot, das û gim  
Ez bûm xudan kar û mal  
Ser ew gırava qedım

Ew jinê pırr dom nekır  
Şer derket mın wenda kır  
Her tışt lı dest mın de çû  
Tenê me can felat kır

Lı wê rabûm rêketım  
Disa lı ber ba ketım  
Çûm İstembol ciwar bûm  
Dıl xemgin berxwe ketım

Lı wê em man bırçi, ti  
Kesek mera nebû si  
Şeş sal lı wê derbaz bûn  
Dûra mın dit war û ci

Hatım ketım ev welat  
Hesret mın ra bû xelat  
Lê lı Xwedê her şıkır  
Zar zêçên mın bûn felat

Gund, welat ez birnakım  
Mal, dırav dıl şanakım  
Bı roj û şev dıgırım  
Ez çavan zıwa nakım

Erd û warên Kurdistan  
Lı tev rez û bax, bostan  
Ber çavên min de naçin  
Ew deşt, zozan, daristan

Lê tîrbên dayik, bavên  
Ew qet naçin ber çavan  
Keşka welatê xwe de  
Bımama şivan, gavan

Ew kari dîbûm razi  
Îro dîl ew dîxwazi  
Lê çî bîkîm ew roj çû  
Qet nay cih ev daxwazi

Ew kevîr û sinc û dar  
Çen, kani û avên sar  
Hesreta wan dîkşinim  
Lı rojê de hezar car

Welat bîr tinim bî dîl  
Lê dîl bûye birin, kul  
Lı qefesa zêrin de  
Ahx dîbêjim wek bîlbîl

Kalandîna berx, karan  
Bêhrivanên bîn daran  
Doş û reng kîlamên wan  
Ez bîrnakîm çucarînan

Valeyên zer, sıpi, sor  
Kesk û çeqer, pembe, mor  
Dıdan ser kum gulikan  
Kılam dıgotın dor dor

Ewan ez qet birnakım  
Berçav de wenda nakım  
Tên bira mın dıgırım  
Negırım tewat nakım

Lê iro ez her dûrım  
Nexwaşım, birin kûrım  
Nabinım welatê xwê  
Bûme Pepûg, dıl hûrım

Dijmın riya mın qut kır  
Pergala mın belav kır  
Nehişt ez bıçım welat  
Hesret mın ra pêşkêş kır

Tırk dijmine nine dost  
Çermê beraz nabe post  
Bav kalên me dıgotın  
" Giya hene nabın bost "

Hosiya mın Kurdan ra  
Bırazi, xarziyan ra  
Dewleta Tırk neyare  
Qet dost nabe jı mera

**Sydney pırr xweş, şirine  
Ne hawar, ne qirine  
Lê dilê Rızê Guran  
Hemû kul û birine**

**1-1-1994**

## PIRSÎN JI XWEDÊ RA

Tera dibên " Tu mezîni "  
Gelo ev a çiqas raste?  
Tu qenterî, tu mizîni  
Gelo ev a çiqas raste?

Ev cihan te çêkiriye  
Bî gul, çiçeg reng kiriye  
Dar, şîneyî dakiriye  
Gelo ev a çiqas raste?

Kevîr û dar, hewa û av  
Roj û şev û sayî û tav  
Afrandiye te dayîk, bav  
Gelo ev a çiqas raste?

Ango ew Hewa û Adem  
Kesên wek Hitler û Saddam  
Tu cihan dînhêrî her dem  
Gelo ev a çiqas raste?

Tu afîrdêr, tu dadmendi  
Tu nemîrî, her tîm zîndî  
Cihan, Xweza bûyî xwedî  
Gelo ev a çiqas raste?

Hemû mirov qûlên tene  
Weka kêç û kurên tene  
Te daye wan giri, ken e  
Gelo ev a çiqas raste?

Em dımırın, tu namırı  
Tu ne jın i, ne ji mêr i  
Dıbêjên " tu afırdêri "  
Gelo ev a çiqas raste?

Ma lı kuye dojev, bihişt?  
Kesên dın, har û têgihişt  
Tu xwediye cihan, her tışt  
Gelo ev a çiqas raste?

Dıbên " tu hemû qûlên xwe  
Dıbini mina çavên xwe  
Wek ruh, can û bedena xwe "  
Gelo ev a çiqas raste?

Ku usa ye lı te pırs kım  
Rewşê binım lı berçav kım  
Ku te binım şûna xwe kım  
Gelo ev a çiqas raste?

Ma em Kurd qûlên te ninım?  
Em ji mina herkes Ninım?  
Ber çavên te zılm dıbinım  
Hebûna te çiqas raste?

Tırk û Ereb û Farıs'ên te  
Lı bın poz û ber çavên te  
Me dıkujın bı navê te  
Mebêj "Derew" ev a raste

Hezar salın me dıkujın  
Nabên zarok, nabên kal, jin  
Dojeh kırine mera jin  
Ev ne derew, ev a raste

Bêje çıra tu bûy çav kor?  
Wer dînhêri esman lı jor  
Qet nabini tu xwina sor  
Lal û kori, ev a raste

Mal xırabo çıra bêdeng  
Lı hember çek, tıfing, fişeng  
Dısekını tu naki ceng  
Ev ne derew, ev a raste

Têne kuştın, zarok û jin  
Bı destên ew har hov û din  
Tu dibini dibê " Amin "  
Hebûna te çiqas raste?

Êdi lı te bawer nakım  
Bı navê te dıl şa nakım  
Destan jı bo te ranakım  
Henek nakım ev a raste

Jı ber ku tevda tuneyi  
Ne sewabi, ne guneyi  
Tu ne rengi, ne huneyi  
Ku bıbinım bıbêm " raste "

Her tım tu lı tev kedxwaran  
Tev mêrkujan, tev barbaran  
Dıkuji zar, zêç, dewaran  
Ev ne derew, ev a raste

Tıştê tune ra lom nakım  
Xwedê, madê bawer nakım  
Usa dıbêm fedi nakım  
Tunebûna te her raste

Jı ber ku ez te nabinım  
Zılm û zoran pırr dıbinım  
Jı bo ev çav şıl, dıl şınım  
Herkes dıbine ev raste

Te qet nedit Dêrsım, Zılan  
Ew Helebce ahxa dılan  
Tevkuştına Axri, Fılan  
Mın ra mebêj ev ne raste

Bı eşkera ez dıbêjım  
Te pırs dıkım, ne dın, gêjım  
Carek dın ez dısa bêjım  
Tu tuneyi, ev a raste

Usa dıbê Rızê Guran  
Te nedit ew Şêxê Piran  
Tev axına bav, bapiran  
Qet nebıhist, ev a raste

2-1-1994 Sydney



## EV E JİYAN

Ev cihana dor bı dore  
Ki l jêre, ki l jore  
Ki dibini, ki çav kore  
Ki birçi têt, ev e jiyan

Usa dumeşe ev jiyan  
Ki bın tavê, ki bın siyan  
Ki qesranday, ki ser çıyan  
Djın dıçın, ev e jiyan

Her hebûnek du aliye  
Cıwanti û pir kaliye  
Erd û esman, av xaliye  
Zıman, gotın, ev e jiyan

Ev zagona Diyalektik  
Alik berjêr ewraz û tik  
Yek erê ye, a dın ji rık  
Erê, na ye, ev e jiyan

